Îraq li ber sînaryoyên dabeşkirinê

Loqman Asîhî

Tiştê ku niho bi ronî di dewleta Îraqê de dê dîtin û hest pê dikin, ji binçîna rijêma totalîtariya Sedamî ye. Ji bilî wê yekê hemû tiştên din formekî mijewî û şêlo bi xwe ve girtine û li hember pirs û guhorînanin: Çi core sistemek wê li ser şûnwarên Sedamî bihê avakirin, tu bibêjî ew sistem sistemekê takanebe bi wateya wê yekê ku Îraq yek welate bi tev welatiyên xwe ve? Yan tu bibêjî dê bibe sistemekê fediralî yan konfediralî? Başe heger hat û pilana êmnahiyê ya niho ser negirt û şikest, çi li şûna wê dê bikeve rojevê? Tu bibêjî Îraq ber bi şerekî navxwe yê mezin ve diçe ku ter û hişk di nav de bihêne şewitandin? Ev yek û hêşên din jî çend dê kartêkirina xwe hebin li ser parçebûna Îraqê? Ma baştir nabe heger Îraq bi awayekî siruştî dabeş bibe?

Di vî tewerî de yê ku ji aliyê kovara Nûbûn ve hatiye pêşniyarkirin hewil wê bê dan ku di rêka van pirsiyarên li serî hatîne azirandin, mijara dabeşbûn yan parçebûna Îraqê bihê baskirin û ravekirin ji ber ku rewşa ku nihu Îraq têre derbaz dibe pêdivî rawestiyaneka siyasiya ji vî terzî ye. Bo nimûne li gorey raporteka UN ê ya ku li dawiya sala 2006- ê ketiye holê, kesanên sivîl yên ku hatine kuştin bi kêmahî 34 hezar kes bûne û hêzên hevpeymanan jî 3500 kuştî dane ku pişka mezin ji wan ji leşkerê Emrîkayî bûne ku behra wan pitir ji 3200 serbazan dihê texmînkirin. Deh hezar kes bi destê giropên çekdar hatine revandin û ta niho jî çarenivîsa wan xuya nebuye. Nêzîkî 30 hezar girtiyan di zindanên Îraqê û leşkerê emirîkî de hene. Dîsan û her li gorey wê raportê nêzîkî melyonek û heşt sed hezar kesên Îraqî ji cih û malên xwe ji ber karên dijwarkariyê mişext bûne û li hinek cihên din akincîbûne. Li aliyekî din û di heman raportê de wisa hatiye diyarkirin ku nêzîkî pênç melyon Îraqiyan ji Îraqê reviyane û niho li Surî, Urdinê, Îranê û welatên din akincî bûne.. Rêjeya bêkariyê jî gehiştiye 50% û sêka xelkî di tuxîbê hejariyê de jiyana xwe derbaz dikin.

Ankûya vê yekê wisa diyar dike ku Îraq bi duristî di rewşeka şepilî de ye û çi sînahiyên xweşiyê jî di rojevê de diyar nînin. Li vê derê pirsiyare xwe dihîne ziman eve: Gelo çareserî çî ye?

Beriya bersiv li ser vê pirsiyarê bihê dan pêdiviye bihê diyarkirin ku Îraq bi xwe weku welat, welatekî rengaûrenge. Ango ne tenê ji rengê kurd pêk dê yan yê ereb yan sunî yan şiî û di dirêjiya dîrokê de jî çi caran taybetiyên van rengan bi awayekî şaristanî û lîbral nehatine parastin û di leşê vê dewletê de ne hatîne bercestekirin. Belku her dem cudahiyeka mezin bo vî rengî li ser kîsê rengê din hebûye. Helbet wê pirosesa ne durist jî hemû deman ew tişt dianî holê ku ev rengên henê û bi taybet kurd û şiî ye xwe ji derveyî leşê vî welatî bibînin û li cihekî din de li hebûna xwe bigirin û evro dema ku terazuwa hêzan di navbera van rengan de têk dçe, hîngê her rengek hewl dide xwe biparêze û mafên xwe dabîn bike û ev yek jî gelek caran dibe sedema wê çendê ku hevrikiyek di navbera wan rengan bikeve holê û dijwarkariyên mezin jê ji dayik bibin weku evro di navbera şiî ye û suniyan de heye û bûye rastiyek. Li vê derê carek din dibêjim ma çareserî çiye?

Emar Elhekîm ku yeke ji endamên payeberzên civata bilind ya îslamî ewa ku Ebdulezîz Elhekîm rêberayetiya wê dike, li hembera sedan kes ji hevalên partiya xwe di bîreweriya tîrorikirina damezrênerê civatê digot: Herêma başurê Bexda, herêma Bexda, herêma Kurdistanê, her herêmeka din li her devereka din ji Îraqê rêke çarene û em dê pişteyanyê lê bikin û her wesa em dê kar bikin ji bo bicihanîna sistemê fediralî li welatî. Ev daxûyaniyên Emar Elhekîmî ta radeyeka mezin derbirînê ji heza rêjeyka mezin ji xelkê başurê Îraqê dike ku pitiriya wan şiyene û (bakurê Îraqê) jî Kurdistan niho weku piraktîk sistema fediralî lê berceste bûye ku wate core hizreka dabeşbûnê ne ku parçebûnê di rojevê de heye bi taybet li aliyê kurd û şiyeyan. Tiştekê din jî dibe li vê derê bihê baskirin ku ew jî daxwaza sînatorê dîmokratî Cuzîf Baydin û serokê şanazê civata peywendiyên derve ji bo parçekirina Îraqê li ser sê herêman (kurd, şiî ye, sunî) ku her herêmek bi xwe hukimdariya xwe bike her çende hindek alî li dijî vê daxwaziyê rawestiyan lê endama civata pîran Kîlî Baylî Huçîsun wê wisa dît ku tenê bi rêka parçekirina Îraqê rewş dê tenha bibe.

Li ser vê mijarê û ji bo têruteselkirina vî babetî kovara Nûbûn hewl daye çend dîtinên Kurdistanî kom bike û deyîne ber çavên xwendevanan, nivîserên pişkdar evin:Ebdilhusê Şeban, Îsa Tahir, Behri Reşîd, Şivan Şêxo û Ehmed Miho Hacî.